

Careke dî li ser pirtûka RÊYA JÎYANÊ...

Min li ser pirtûkê berî nihe du nivîsên agehdarîyê hazir kiribûn û weşandibûn... Piştî ku pirtûk gihişte destê min, min berê xwe dayê ku bi rastî jî di nigeraniya xwe da gelekî heq bûme... Ew endîşeya min ya li ser çapa pirtûkê ku dê bête seqet kirin, dê tehrîfat lê bête kirin, rast derket... Hetta hêj zêdetir, destwerdan lê hatîye kirin... Ked hatîye xwarin...

Lewma mecbûr im careke dî agehdarîyekê bidim li ser çapa pirtûkê. Êdî hewce nîne ku ez behsê çawa pirtûk hate amade kirin bikim... Çiku hem ew herdu agehdarîyên min, hem jî orîjînalê pirtûkê bi xwe vê yêkê aşkera dikin...

Heqîqetek e ku di weşangerîya bi giştî Kurdî da organîzebûneke rêkûpêk ya li ser prensîb û normên etîk nîne. Sebebên vê piralî ne helbet. Lê yêk ji sebebên jî nezanîna qîmetê kedê ye. Bi taybetî jî keda mejî, keda bîr û hizrî. Di vî warî da bêperwatîyeke bêtixûb heye. Herkes, her weşanxane, her weşanger, xwe otorîteyê/a zimanî qebûl dike û her pirtûka hate ber destî li goreyî xwe çap dike, diweşîne... Di vê mijarê da profesyonelî nîne û nayê fikirîn. Di navbeyna weşanxane û nivîskar û amadekar da diyalog nîne. Weşanxane li goreyî xwe çarçoveyekê dadine û pirtûka bo hatî, dîsa li goreyî xwe çap dike, diweşîne û xilas...

Helbet weşanxaneyê dê rêz û rêzikek hebe. Lê gava pirtûk hate ber destî divêt nivîskarî/ê, an amadekarî/ê agehdar bike û çarçoveya xwe jê ra bêje. Li hisaba terefan hat kar dê dom bike, nehat kar radiweste... Eve jî bi diyalogê dibe, bi hevdu agehdar kirinê dibe... Weşanxane pirtûkê bêyî agehdarkirina nivîskar an amadekar, formê xwe bide pirtûkê û çap bike an biweşîne, nabe... Di vê bazarê da şik tê da nîne ku nivîskar an amadekar jî divêt aktîv be û li ser berhemê xwe raweste, taqîb bike û prosesê bi timamî nehêle di însiyatîva weşanxaneyê da... Lê belê, eve nayê wê manayê ku weşanxane dê bi ya xwe bike. Ferz bikin, nivîskar an amadekar berpirsiyarîya xwe neîna cih anjî bi dilekî pak û temîz bawerî bi weşanxaneyê îna. Bes di rewşeke wisa da jî weşanxane divêt erkên xwe yê beramberî nivîskar an amadekar bi cih bîne, profesyonel hereket bike, muhatabê xwe ji her merheleyê agehdar bike ku muhtemel kêmasî an qusûrî çênebin. Weşanxane lazim e vê hessasîyetê bo navê xwe, bo prestîja xwe, bo prensîbên xwe jî nîşan bide.

Mixabin di vê bûyera me da eve nebûye û di encam da weşanxaneyê bi serê xwe hereket kirîye û adeta bê prensîbî bo xwe kirîye prensîb û xwe ferz kirîye, nivîskar an amadekar ji dewreyê derêxsitîye û formê xwe daye pirtûkê, li goreyî xwe pirtûk meqes kirîye û gelek tiştên dî... Di vê operasyona xwe da jî qet digel nivîskar an amadekar têkilî nedanaye, fikira wan nepirsîye, daxwazên wan li ber çav negirtine...

Dîsa ve gelek mixabin ku, ji bilî istisnayan, eve qusûreke mezin ya bi giştî weşangerîya Kurdî ye... Bi her hal em bêne ser numûneya xwe...

Dr. Hesên Şetevî, dostê min yê salan, bîrewerîyên xwe nivîsîne û bi navê Rê û Qeder bi soranî û farsî çap kirine... Daxwaz ji min kir ku kurmancîya bîrhatinên wî amade bikim. Ji ber huqûqê hevaltî û dostayetiye min daxwaza wî qebûl kir. Wî jî her çi tekst û materyalên xwe hebin bo min rêkirin. Min her di xwandina ewil ya tekstên wî da dît ku ev materyale gelek tevlihev in, di nav xwe da dijber in û

harmonîyek nîne û herweha kurmancî jî bin, bi lojîka zaravayê soranî ne... Min eve gelek vekirî ji Dr. Şetevî ra got ku karê li ser pirtûkê dê wextekî dirêj bikêşe, çiku malzeme gelek belav, dubare û bêserûber bûn... Axir wî jî qebûl kir û min salek wext da amadekarîya pirtûkê. Car hebû bi seetan digel Dr. Şetevî bi telefonê axivtim. Her tekst an belgeya ku nû rêdikir min bi eynî hessasîyetê ji nû ve amade dikir. Resim jî herwisa... Xulase, min ew tekst û materyalên rêkirî ji serî pê ve serad kirin, paşê bêjîng kirin û herî dawîyê jî moxil kirin û pirtûk bi rengê li ber dest hazirî çapê kir û navê RÊYA JÎYANÊ jî lê kir. Anku min pirtûk hem ji alîyê naverokê, hem bi navekî nû û hem jî ji alîyê mîzanpaj û dîzaynê ve jî komple amade kir. Li ser daxwaza Dr. Şetevî min pêşgotinek jî nivîsî bo pirtûkê... Her di serî da min tinê daxwazek ji Dr. Şetevî kir ku pirtûkê herwekî min amade kirî bide çap kirin. Wî jî soz da ku mutleq dê vê daxwaza min bîne cih...

Di vî demê amadekarîya pirtûkê da, Dr. Şetevî got ku wî digel Kendal Nezan, Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê têkilî danaye û jê xwastîye ku pirtûka wî çap bikin. Kendal Nezan jî qebûl kirîye. Gava Dr. Şetevî eve bo min behs kirî, min ji tecrubeya salan û nasîna kultura negatîv ya weşangerîya Kurdî, ew hişyar kir ku garantîyê werbigire ku destkarîyê di pirtûkê da nekin. Wî jî şîfahen gotîye Kendal Nezanî û wî jî soz daye ku dê pirtûkê herwekî hatîye rêkirin çap bikin. Bes bi her hal min teklîfî Dr. Şetevî kir ku em bi hev ra nameyekê bo Kendal Nezanî binivîsin û tikayê jê bikin ku pirtûkê herwekî min amade kirî çap bikin. Dr. Şetevî jî qebûl kir û me name bo Kendal Nezanî nivîsî û rêkir... Ev hemû hewildanên min ji ber parastina pirtûkê û keda hatîye dan bû...

Lê mixabin ew endîşeya min ya ku dê tiştê bi serê pirtûke bêt, pêkhat...

Ewil, Dr. Şetevî ji nasekî xwe haydar dibe ku pirtûk çap bûye û bergê pirtûkê jî jê ra hatîye şandin... Piştî ku Dr. Şetevî bergê pirtûkê dibîne, aciz dibe çiku her ji bergî xuya dibe ku destwerdan lê hatîye kirin. Navê nivîskarî wekî ku hatîye rêkirin nenivîsîne. Resmekî ku ne ji aîleya Dr. Şetevî danane ser bergî û paragrafa ji nivîsa min ya li ser bergê piştê jî rakirine... Di wî demê da telefonî edîtorê Weşanxaneyê Avestayê, Abdullah Keskînî jî dike û nerazîbûna xwe dide xuya kirin. Li goreyî gotina Dr. Şetevî, edîtor Abdullah Keskîn gelek bêrêzane digel wî axivîye û gotîyê ku ew wî muhabat wernagire... Dr. Şetevî telefonî min kir û hem ez agehdar kirim, hem jî acizîyeta xwe di dereceya herî bilind û dijwar da îfade kir. Min ew teskîn kir û tika jê kir ku pirtûkê bo min jî rêbike...

Piştî demekî dirêj çend nusxe bo min rêkirin Dr. Şetevî. Min lê nêrî ku heqîqet destwerdaneke bêperwa li pirtûkê hatîye kirin. Ez dê xal bi xal li jêr behs bikim û wê seqetîya Weşanxaneyê Avestayê kirî destnîşan bikim...

Li vê derê tiştê giring ew e ku Weşanxaneyê Avestayê ku li nav weşangerîya Kurdî navekî baş jî heye, çawa ev xirabîye kirîye... Ma norm û prensîbên unîversal yê weşangerîyê nizanin, ma ji erf û edetên pozîtîv yê civatê haydar nînin û gelek tiştên dî... Dizanin, helbet dizanin, bes boçî ev kêmasîye, ev qusûre kirine, pirs ev e... Cidden cihê pirsê ye, Weşanxaneyê Avestayê û edîtorê wê Abdullah Keskîn çi hewce dîtîye ku destwerdaneke hinde kirêt bike li pirtûkê... Çawa ev heqe di xwe da dîtîye?.. Belê, eve pirsek esasî ye, çawa ev heqe di xwe da dîtîye ku bêyî pirs û pirsîyar pirtûka jê ra hatîye rêkirin bi serê xwe hinde seqet û xirab bike...

Di prosesa weşandin û çapkirina vê pirtûkê da, ewil nivîskar Dr. Hesên Şetevî heye, wekî amadekar ez heme, wekî sozdêrê çapê Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê birêz Kendal Nezan heye ku em dizanin têkilîyên wan jî bi çi rengî ne... Min û Dr. Şetevî nameyeke gelek kubar û dostane bo Kendal Nezan nivîsîye ku pirtûk herwekî me amade kirî bête çap kirin û wî jî bi wî navê xwe yê heyî, soz

daye ku pirtûk herwekî hatîye rêkirin dê çap bibe... Başe qîmetê van hemû kesan li nik Weşanxaneyê Avestayê û edîtor Abdullah Keskîn qet nebûye... Gelo maqûl e ku Kendal Nezan ew tikaya nivîskar û amadekarê pirtûkê jê kirî, ji Abdullah Keskîn ra negotibe...

Ji pratîka Weşanxaneyê Avestayê û Abdullah Keskînî, çiku pirtûk derketîye bazarê, zelal bûye ku ev guhorînkari û destwerdana li pirtûkê hatîye kirin bi zanahî û plan hatîye kirin... Ji xwe ji nameya Dr. Hesên Şetevî jî eve baş tete dîtin...

Helbete cihê pirsê ye ku gelo birêz Kendal Nezan, Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, çend agehdar e ji vê kiryara Abdullah Keskînî. Hindî ku tete zanîn têkilîyên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û Weşanxaneyê Avestayê, yê Kendal Nezan û Abdullah Keskînî zêde germ in, lewma ihtimala ku hayê wan ji hev nebe kême, bes digel hindê jî hevî dikim ku destê Kendal Nezanî di nav vî karê hinde kirêt da nebe... Çiku Kendal Nezan di dawîya pêşgotina xwe da heq teslîmîyek kirîye û wisa gotîye: "Birêz Rojan Hazim çapa Kurmancî ya pirtûkê bi zimanekî spehî û rewan pêşkêşî xwendevanan dike."- [r.14, Rêya Jîyanê-Stanbol 2019, Weşanxaneyê Avestayê].

Weşanxaneyê Avestayê û Abdullah Keskînî, pirtûk wekî yêkser wergêra ji farsî nîşan daye ku her ji vê gotina Kendal Nezanî bi xwe û pêşgotin û nivîsên Dr. Hesên Şetevî yê di pirtûkê da, bi vekişî xuya dibe ku rast nîne ku Dr. Şetevî di nameya xwe da jî vê yêkê zelal dike...

Li alîyê dî, Weşanxaneyê Avestayê bi çu rengî nivîskarê pirtûkê agehdar nekirîye ji van guhorînen xwe. Bi timamî bi serê xwe û li goreyî xwe kirine ev guhorîn ku eve bi gotina herî nerm bêrêzî ye. Piştî ku min pirtûk dît û xwand, vekirî gote nivîskarî, ka reaksiyona wî çî ye... Dr. Şetevî got ku ew şok bûye... Bi telefonê xwe gihandîye Abdullah Keskîn û ev destwerdane jê pirsîye. Abdullah Keskîn gelek bêrêzane gotîye Dr. Şetevî ku ew wî muhabab nabîne û pirsên wî bê bersiv hêlane...

Li ser vê yêkê min îzahatek ji Dr. Hesên Şetevî xwast. Ji ber ku min pirtûka bîrhatinên wî hevalane, dostane bi kurmancî amade kir û jê xwast ku beramberî vê kirêtîya Weşanxaneyê Avestayê pozisyona xwe zelal bike...

Axir, Dr. Şetevî bo min name nivîsî û di vê nameyê da hem ew tehrîfatên weşanxaneyê kirî destnîşan kirine, hem jî lêborîna xwe xwastîye ku nikariye rê li ber vê bêbextîya weşanxaneyê bigire...

Ez dê wê nameya Dr. Hesên Şetevî di pêvekê da bidim.

Herweha wan du agehdariyên ku min behs kirî jî dê pê ve bikim.

Helbet wê teksta ewil ya ku Dr. Şetevî bo min rêkirî jî dê bi formata pdf bidim ku xwandevanên bi wijdan, yê ehlaqî difikirin û herweha yê ku adilbûyînen giring dibînin, teksta ku ewil hatîye rêkirin û amadekarîya min ya orîjînal beramberî hev bikin û bigihîne qenaetekê...

Lê belê, daku bo xwandevanan bête aşkera û zelal kirin, divêt wan destwerdan û tehrîfatên weşanxaneyê kirî li vê derê bidim...

1. Weşanxaneyê Avestayê pirtûk wekî hatîye amade kirin û bo wan hatîye rêkirin çap nekirîye. [Kendal Nezanî soz dabû Dr. Şetevî ku pirtûk da herwekî hatîye rêkirin çap bibe. Têkilîyên Kendal Nezan û Abdullah Keskînî, anjî bi reneki dî, têkilîyên Weşanxaneyê Avestayê û Enstîtuya Kurdî ya Parîs jî baş tete zanîn...]
2. Navê amadekarî ji ser bergê pêşîyê, ji rûperê yêkemîn rakirîye û tinê di rûperê duyê da daye. Herwisa navê nivîskarî jî, wekî wî bi xwe nivîsî, nedaye.
3. Pirtûk, li ser tekstên ku ji soraniya bi tîpên aramî-erebî-farsî hatîne veguhastin û gelek tesktên dî yê ji teref Dr. Şetevî ve cuda hatîne rêkirin, bi timamî ji nû ve bi kurmancî hatîye

amade kirin û navê RÊYA JÎYANÊ lê hatîye kirin. Anku Dr. Şetevî tekstên cuda yên bi tîpên latînî rêkirine û min kurmancîya pirtûkê li ser wan materyalên gelek belav, şaş, bêserûber, dubare û tevlihev, adeta ji nû ve nivîsîye... Lewma nîşandana pirtûkê yêkser wekî "wergêra ji farsî" rast nîne, destwerdan e, tehrîfat e ku eve jî di nameya Dr. Şetevî da hatîye teyîd kirin...

4. Resmên min yên bi Dr. Hesên Şetevî ra û herwisa nameya ku Dr. Hesên Şetevî wekî spasî bo min rêkirî ku di dawîya pirtûkê da bû, hatine rakirin.
5. Paragrafa ku ji pêşgotina min hatîye wergirtin û li bergê paşîyê hatîye bi cih kirin jî hatîye rakirin û li şûnê nivîsa Kendal Nezanî hatîye bi cih kirin.
6. Pirtûk ji alîyê îmla-gramatîk ve jî hatîye seqet kirin û halê nomînatîv bi timamî hatîye xirab kirin.

Di weşangerîyê da hindê norm hene ku divêt rîayet lê bêne kirin. Weşanxane û weşanger divêt bi normên wijdanî, ehlaqî û edaletê ve mutleq girêdayî bin. Heqê weşanger û weşanxaneyê hind heye ku heke pirtûk bi dilê wan nebe dikarin çap nekin, neweşînin. Anjî heke pêşniyareke wan hebe jî divêt mutleq digel nivîskarî/ê di nav têkilîyê da bin û bêyî erêkirina wî/wê çu guhorînan li pirtûka wî/wê nekin...

Ji nameya Dr. Hesên Şetevî xuya dibe ku qet têkilî bi wî ra nehatîye danan û Weşanxaneyê Avestayê guhorînan bi timamî ji ber xwe ve kirine. Ev reftara Weşanxaneyê Avestayê, wijdanî nîne, ehlaqî nîne, adil nîne...

Di encam da; nihe çî bêjim? Ez wekî amadekarê pirtûkê çî bêjim? Min wext û kedêke mezin daye pirtûkê... Û min eve bêyî bedelekî maddî wekî hevkarî û destekeke hevalane û dostane kirîye ji bo Dr. Hesên Şetevî... Min ji kom û desteyeke nivîsên bêserûber, belav, tevlihev, dubare û şaş ev pirtûka kurmancî amade kirîye. Li ser daxwaza nivîskarî min pêşgotin jî nivîsîye... Ji bilî amadekarîya naverokî, mîzanpaja pirtûkê, hazîrîya albûmê û bi cih kirina resman û nivîsîna agehdarîyên resman, sîstematîze kirina nivîs û resman ya bi rengê kronolojîk hemû min kirine û pêvek jî lê zêde kirine... Anku min pirtûk tam û komple hazîrî çapê bo Dr. Hesên Şetevî û amozaya wî Xanim Suheylya Qasimlo rêkir û wan jî teslîmî Kendal Nezanî kir. Dr. Hesên Şetevî hem di pêşgotina xwe da hem jî bi nameyeke xusûsî, bi minetdarî spasî min kir. Ew nameya ku wekî spasdarî bo min rêkirî di dawîya pirtûka xwe da jî bi cih kir. Lê weşanxaneyê ew name jî rakirîye, resmên min yên digel Dr. Hesên Şetevî jî derêxistine ji pirtûkê...

Vêca ez çawa vê kiriyara Weşanxaneyê Avestayê û edîtorê wê Abdullah Keskînî, wekî xeletîyeke rêzê anjî biçûk bibînim... Hûn werin navê min wekî amadekar ji ser bergê rakin, tinê li rûperê duyê biden, pirtûkê wekî "wergêr" nîşan biden, resmên min yên bi nivîskarê pirtûkê ra rakin, nameya ku nivîskarî wekî spasdarî bo min rêkirî ji pirtûke derêxin, paragafeke ji pêşgotina min ji bergê paşîyê biavêjin... Başê ez vî karê Weşanxaneyê Avestayê û edîtorê wê kirî, bi kîjan sifetî an sifetan bi nav bikim... Gelo mirov çawa ewqas şûra xwe berze dike û bêbext dibe ku daberizîne di keda mirovên dî da bike...

Navê vî karê neqenc yê ku Weşanxaneyê Avestayê û Abdullah Keskînî kirî, dikare bibe çî?..

Pîştî van kirêtîyên Weşanxaneyê Avestayê û edîtorê wê Abdullah Keskînî kirî gelo "teessufê dikim" bêjim têra dike?..

Êdî çî bêjin?.. An çî dikare bête gotin?..

Mixabin ku di vê pratîka Weşanxaneya Avestayê û edîtorê wê Abdullah Keskînî da çu niyetqencî nayê dîtin...

Hêvî dikim, ev mûsîbeta Weşanxaneya Avestayê û Abdullah Keskînî bi serê nivîskar û amadekarê pirtûka RÊYA JÎYANÊ înayî bo hemû weşanger û weşangerîya Kurdî dersdêr be ku êdî ev xeletî û qusûr dubare nebineve...

Weşanxaneya Avesta û Abdullah Keskîn bila vê şîretê qet ji bîr neken û bo guhê xwe bikene guhark: Heqê xwe û keda xwe nedene xwarin, belê heqê kesê û keda kesê jî nexwen!..

ROJAN HAZIM

31 Adar 2020

Pêvek:

Belge, bi formatên pdf li jêr in. Hûn dikarin lê binêrin û herweha reşnivîsa pirtûkê û amadekarîya dawîyê bidene ber hev. Hingê dê derkeve meydana ka rola amadekarî çend bûye di pirtûkê da... Ev hemû belge, bi formatên pdf di vê malperê û blogê da ne:

<http://www.institutakurdi.org/>
<https://xwezabawer.blogspot.com/>

1. Reşnivîsa (taslaxa) ku Dr. Hesên Şetevî bo min rêkirî ya bi navê Rê û Qeder.
[Ru00EA u00FB Qeder-Dr H Shetewu00EE doc-kopi-5.12.2014]
2. RÊYA JÎYANÊ-Orîjînal pirtûkê ya ku min amade kirî.
[3.FinalFinal-Rêya Jîyanê-Dr.Shetevî-A5-RH]
3. Nameya ku me (Dr. Şetevî û RH) bo Kendal Nezan nivîsî.
[Bo-KENDAL-NEZAN-7.2.2019-Dr.Shetevi-RH]
4. Agehdarî-1
[Li ser pirtûka bîrewerîyê ya Dr. Hesên Şetevî, RÊYA JÎYANÊ - ROJAN HAZIM - 8.2.2019]
5. Agehdarî-2
[Agehdarîyeke giring li ser pirtûka RÊYA JÎYANÊ-RH-14.12.2019-kopi]
6. E-maila Xanim Suheyla Qasimlo [e-maila Suheyla Qasimlo-8. feb. 2019-kopi-2]
7. Nameya ku Dr. Hesên Şetevî bo min nivîsî û rexneya wî ya li ser Weşanxaneya Avestayê.
[Bo Rojan Hazim-Dr. Hesên Şetevî-24.2.2020]

Not:

Helbet di vê prosesê da reftara dostê min Dr. Hesên Şetevî jî, mixabin, gelek zêde pragmatîk bû (ku eve negatîv e), lê wê, vê gavê cuda dikim... Çiku li ser vê meseleyê di rexneyên xwe yê şifahî da vekirîye, lê di yê nivîskî da xwe sansûr kirîye... Dîtin û rexneyên wî yê şifahî kirî jî wekî tekst hatine amade kirin ku ew jî dizane, agehdar e, lê ji ber tikaya wî naweşînim...